Ibin Teymiye

(2-2)

(1240-1307 Zayînî) (661-728 koçî)

Ji dev Ebî Hureyre, Xwedê jê razî be, hatiye ku:

Xwedê di seriyê her sedsalekê de yekî dişîne,

ku ji vê neteweyê re ola wê serrast bike

(Ji Hedîsên cenabê pêxember, hem Ebo Dawûd bi senedekî dirist aniye zimên û hem jî Elh'akêm.)

Dezember 19, 2009

Di birrê pêşîn ê vê gotarê de, me li ser pêşdem û navdema jiyana zanayê mezin, Şeyxulîslam Îbin Teymiyê hinek agahî bi kurtî anîn zimên, û di vir de emê li ser kesayetî, xwendin, brehem û ramanên qehremanê Kurd rawestin.

Îbin Teymiyê di sala 1240 ê Zayînî de, li Heranê, ku dikeve navbera Dîcle û Ferat, ji dayîk bûye, û hîn ew şeş salî bû, bavê wî ji ber hêrişên mezin ên Tetaran ber bi welatê Şamê ve bar kir. Tê gotin, ku bavê wî, yê ku zanayekî olî yê navdar bû, gelek pirtûk bi xwe re rakiribûn, lê tevî ku Tetaran rê li wan û li rêwiyên dî digirtin, û mirov talan dikirin, dikuştin, jin û zarokên wan ji xwe re dibirin û pirtûk disotandin, tiştek bi serê wan di rê revê de nehat. Xwedê tea'la Kurê Teymiyê parist, da bibe mestirîn zanayê ola Îslamê di dûrokê de.

Malbata Îbin Teymiyê, wekî me berê aniye zimên, Malbateke zanîn û olparêziyê bû. Şêx Ehmed kurê Mihemedê Heranî, ku di sala 1324ê Zayînî de koç kiriye diyarê dilovaniyê, destnivîsên malbata Teymiyê di bingehên Fiqhê de civandin û dan ser hev. Pirtûka wê di wê mijarê de, ku bi Erebî ye û navê "Elmiswedde fî Usûl Elfîqh" ji me re diyar dike; çendîn ev malbat di berdestiya zanîna olê de bû û têgihîştî bû di warên zanînê yên cihê-cihê de.

Di cîhana îslamî de, gelek zanayên olê, şah û şahzadeyan, qeral û deselatdaran, dara malbata xwe pêdakirine, û koka wê gihandine malbata cenabê pêxember. Li hemî welatên musilmanan ev terzê pevgirêdanê heye, û bo wan malbatan dibêjin „Seyda" an „Esyad" an „Seyyid". Em tev dizanin ku malbata cenabê pêxember „erebî" ye, lê wan malbat tew ne Ereb in... Kurê Teymiyê wilo nekiriye û negotiye ku ew ji malbateke wilo ye, eve jî nîşaneke dî ye, ku malbata wî Kurd e, ne Ereb e.

Li gor nivîsên gelek dûroknasan, Îbin (Kurê) Teymiyê di gelek warên zanîn û huneran de wekî kesekî pir jêhatî, jîr û wekî pêşmêrekî dihate dîtin. Ew piçekî di helwêstên xwe de hişk bû, û seriyê xwe ji çi zorbazan re danexist. Dibêjin ku pita wî wilo wêrek û req bû di helwêstên xwe de. Carina Kurê Teymiyê digot: "*Wê neyar ên min bi min çi bikin? Behişt û baxê min di sîngê min*

de ne, ez ku ve biçim ewan ji min verê nabin. Zindana min xelweta 'tenahiya' min e, kuştina min şehîdbûn e, û derkirina min ji nişte min geşt e (siyah'et e)".

Di zindanê de jî digot: "*Girtî ewe, yê ku dilê wî ji Xwedayê wî hatiye girtin, û destegîr 'esîr' jê ewe, yê ku bi ber bayê dilê xwe ketiye*."

Ma kî dikane mirovekî wilo xudan baweriyeke mekin binzor bike?

Kurê Teymiyê, ku li ber gelek şêxên Kurd û Ereb xwendiye û pir bi bavê xwe jî hikar bûye, bi pesindarî navê şêxê Êzdî yê tev navdar, U'dey kurê Musafirê Hekarî, di nameyeke xwe de tîne zimên û nameyeke taybet bo peyrewên wî dişîne. Wî bi „Şêxê nasyaran" dide navkirin û yek ji nêztirîn şêxên xwe yên ji "Ehlisunne" dijimêre. Em dizanin ku navên hinek şêxên wî kurdî ne, wekî şêx Mûsayê Zolî, Yehya yê Seyrefî yê Heranî, Zeyneb dota Mekkî yê Heranî, Ebû Ferecê Heranî, Ebû Bekirê Heroyî… Bo naskirina giş şêxên ku Kurê Teymiyê li ber wan rûniştiye û fêr bûye, pêwîste lêkolîner vegere nameya wî, ya ku bi "Mecmûe'tul Erbeî'n H'edîthen" hatiye navkirin. Ew di pirtûkxaneya zankoya Amerîkî ya Beyrûtê de, di bin jimare Aa 1247 M 297.08 de hatiye çapkirin û Erşîvkirin. Wekî tê gotin hikariya 200 şêxên zanîna olî li Kurê Teymiyê heye, û ew bi xwe jî gelek pesindariyê bo Elbuxarî dike û dibêje: "*Ez hezdikim ku Elbuxarî di navbera min û hedîsên cenbaê pêximber de be*." Bi wateya ku baweriya wî bi lêkolînên Elbuxarî heye.

Bêguman, ew keti bû bin hikariya kesên dî yên wekî Ibin Elcewzî, ku bi sedan pirtûk û nameyên wî hebûn, û şêxên ku berî dema wî, an di dema lawaniya wî de, navdar bûbûn, wekî Ibin E'sakêr, Ibin Elethîr, Ibin Esselah', Elizz bin Ebdiselam û Ennewewî û hinekên dî.

Kurê Teymiyê, di sê waran de xudan rêçên mezin e:

-Warê Zanînê

-Warê Rêformê "Îslah'ê"

-Warê Cîhadê

Lew re hikariya wî li gelek şagirdên wî hebû, ji wan jî hinek gihane bilindtirîn pilayên zanîna olî di cîhana îslamî de, ji wan:

Îbin Elqeyyêm Elcuziye, Ebû Ebdullah Ezzehebî (Turkmen e), Elh'fêz Îbin Kethîr, Ebûlebbas Îbin Qadiye (Qadî Elcebel), Umer Elwerdî, Şemseddîn Elmeqdîsî û gelek ên din, ku ji wan hene xudanên pir pirtûkên hêja ne.

Kurê Teymiyê, diyarî, pere û her tiştekî ku bihna "Reşwetê" jê ditê, ji deselatdaran nedibir û tola xwe ya kesanî ji kesekî hilnedida. Zanayên Misirê ji fetwayeke wî pir nevîn kir û li ba (Essultan Ennasêr) gilî û gazincên xwe dij wî kirin.

Sultan gotê: Ez van dikujim.

Kurê Teymiyê bersivek wilo dayê: "Na nekuje, gava tu wan bikujî, tu hinekên wekî wan nabînî." Sultan gotê: "Van bizava xwe kirin, ku te bikujin. Ne carekê, gelek caran."

Zanayê mezin dîsa jî ji ya xwe danehat û got: "Ewê ez êşandime, ew azad e. Yê Xwedê û pêxemberê wî êşandiye, wê Xwedê tola xwe ji wî hilde, ez bo nefsa xwe tiştekî naxwazim."

Dibêjin ku gava Qazanê Tetet leşkerê xwe yê mezin bi ser Şamê de ajotiye, Kurê Teymiyê derket û çû di rêya wî de rawestiya û bi dengekî bilind bi rêya wergêrekî gotineke mîna vê gote Qazan:"***Te Musilman bi musilmantiyeke sexte xapandin, bav û bavpîrên te gawir bûn, lê dîsa jî tiştê te aniye seriyê me wan ne anî bûn seriyê me, wan soz dan û bi sozên xwe re wefadar bûn, hema te soz da me lê te soza xwe bi cîh ne anî***." Qazanê teter û hêrişbaz li hember xwe kesekî wilo wêrek berê nedîtibû, lew re bi kesayetiya Kurê Teymiyê hikar bû, dilê wî neşikand û ew bi camêrî ji ba xwe bi rêkir.

Kurê Teymiyê di pirtûk û name û fetwayên xwe de, li ser gelek mijaran rawestiye, wekî xuya dibe wî bi Turkî û Îbrî jî dizanî, û pir baş li ser baweriyên Cihotiyê, Filetiyê, û Îslamê dizanî, li ser Kerramiyê, Şîîtiyê, Îsmaîliyê, Nuseyriyê "Elewîtiyê", Qederiyê, Cehmiyê û Mu'tezîle pirtûk ên bi nav û deng li şûn xwe hêştine.

Esseyyûtî, ku lêkolînerekî zana û jêhatî bû, ji zanînên Kurê Teymiyê, di felsefê de, matmayî mabû.

Ezzehebî li ser Kurê Teymiyê nivîsandiye:"*Min destnivîsin Şeyxulîslam Teqiyêddîn, bavê Ebbas, Ehmed kurê Teymiyê civandin, min dît ku ewana hezar pirtûk in, pişt re min hinek dî jî dîtin.*"

Ibin Elqeyyêm Elcewziye, li ser gelek pirtûkên wî yên tefsîrê "şirovekirina Quranê" radiweste û wan yek û yek dide qelemkirinê. Di vî warî de, têgihîştina Kurê Teymiyê wekî kesekî bê wekanî ye. Piraniya lêkolînerên olî û dûrokî yên cîhana îslamî, ji Ibin Elqeyyêm de bigir ta bi şêx Mahmûd Ebo Zehre, di sedsala bîstê de, pirtûka Kurê Teymiyê, ya li ser tunebûna pevçûn û qewxiyê di navbera hiş û Quranê de radiwestin û pir baş dinirxînin, ku bi Erebî navê wê "Der o tea'rud elneqil wel e'qil" e. Hema carekê min li ba mamhoste Mihemmed Salêh Gaborî gota wê pirtûkê kir, wî gote min ku Kurê Teymiyê di hilbijartina vî sernavî de bi serneketiye, ji ber ku hişê mirov nikane her tiştekî di Quranê de hatiye bipejirîne "*Neqil tişteke û e'qil tiştekî hinde caran tersî wê ye*". Mebesta mamhoste Gaborî, ewe ku di warê Mû'cîzatên quranî de hişê mirov tênagihe, ji ber ku tenha çarçiveke maddî ya hişê mirovî heye, têde dikane bilive û bipîve, zagonan pêda bike û li gor wan biryaran bide… Zanayê Fîzîk û jimaryariyê Elbert Einstein jî gilî û gazincên xwe li ser tengemejiya mirovî kirine…

Kurê Teymiyê li ser "Logîkê pîvanî" yê Arîstotalîs pirtûkek nivîsandiye, bi hûrlêkolînî li ser mijar û rêbaza jêkêşanî "Istîqraî" nivîsandiye û rexneyên xwe anîne zimên. Ev pirtûka Kurê Teymiyê, ku ji 587 rûpelane, di sala 1949 Z. ji aliyê hêja Ebdussemed Şerefiddîn ve li Bombay / Hindistanê hatiye belavkirin. Pirtûkeke dî ya Kurê Teymiyê bi navê "Neqdulmentêq" di warê felsefê de hatiye lêkirin, û li Misirê ji aliyê Mihemmed Hamêd Elfeqî ve, li ba çapxaneya Essunne Elmuhemmediye , li Qahîre, hatiye çapkirin.

Li ser Sofîtiyê, Filetiyê û Şîîtiyê, û li ser "Gorperestan" gelek pirtûkên Kurê Teymiyê, yên bi nav û deng hene, ku em nikanin wan di gotareke wilo kurt de yekûyek bînin zimên. Niha li Eurpoa jî hinde pirtûkên wî bi zimanên Firensî, Îngilîzî û Almanî têne wergerandin û wekî me berê gotibû li zankoya Sorbon nivîsên Kurê Teymiyê bilind tên nirxandin û xwendin. Xwendevanên zanînên olî yên Musilman, hinde pirtûkên Kurê Teymiyê, yê ku piraniya wan di zindanan de nivîsandibûn an jî di rewşa hêrişên tund û tûj ên gelek aliyan de, bêtir dixwênin û jê hezdikin. Ji wan jî: Koletî "Elu'boddiye", "Seriyê Husên: Raas el Husên", "Weseka mezin: Elwessiye Elkubra" û " û berhevoka fetwayên wî, ku 37 cild in…